



Bi Bernameya Inglîsî bo Koçberên Temenmezin Inglîsî Hîn bibin Bernameya Inglîsî bo Koçberên Temenmezin (The Adult Migrant English Program)

The Adult Migrant English Program

Inglîsî zimanê neteweyî yê Avûstrliyayê ye. Gel li Avûstrliyayê bi gellek zimanan diaxive, lê axaftin û têgihîştina bi inglîsî dê arîkariyê bide ku hûn di jiyana Avûstrliyayê da bi giştî beşdar bibin. Bêyî zimanê inglîsî, wergirtina hemwelatîtiya Avûstrliyayê, wergirtina xizmetên girîng û serxwebûn dê ji we ra dijwar be.

Bo arîkariyê bidin hûn inglîsî fêr bibin, hûn dikarin li Adult Migrant English Program (AMEP) beşdar bin.

AMEP çî ye?

Dewleta Avûstrliyayê (the Australian Government) diravê AMEP dide û heya 510 saet dersên belaş ên inglîsî bo wan koçber û hatiyên mirovdostane amade dike ku şert û mercn wan lê digire. Eger we vîzeyê herdemî wergirtibe, yan vîzeyê demkî ya xwedan şert û merc û bi inglîsî kêr dikanin yan nizanin, hûn dikarin AMEP wergirin. Hin koçberên ciwan nava 15 heya 17 saletiyê jî dikarin bibin xwedanên van şert û mercan.

Di kurseke AMEP`yê da, hûn ê şîyanên zimanê inglîsî û agahiyên li bara civaka Avûstrliyayê fêr bibin. Hûn ê kesên din ên nû hatine nas bikin û renga hevalên nû peyda bikin. Ev bi hev ra dê arîkariyê bide we û malbata we bi serkeftin li Avûstrliyayê cîwar bibin. Şîyanên zimanê inglîsî bo vê jî gellekî girîng in ku eger hûn bixwazin li Avûstrliyayê kar bikin.

AMEP ji aliyên kesên şareza û erêbûyî va pêk tê û mamosteyên ku bo hînkirina inglîs bo kesên bi zimanên din diaxivin van kursan ders didin.

Ez ê çawan navnivîsî bikim?

Bo wergirtina hînkariya inglîsî bi rêya AMEP`yê, hûn divê heya şeş mehan ji hatina xwe ya Avûstrliyayê yan roja destpêbûna vîzeyê li bal cihêkî erêbûyî yê pêkanîna xizmeta AMEP`ê bo hînbûna inglîsî navnivîsî bikin. Hûn divê kursên inglîsî heya 12 mehan ji hatina xwe ya Avûstrliyayê yan ji destpêbûna vîzeyê xwe hîn bibin.

Ji roja hatina we ya Avûstrliyayê yan destpêbûna vîzeyê we, pênc sal dema we heye bi rêya AMEP`ê zimanê inglîsî fêr bibin. Renge li gor pêdiviya xwe, hûn bibin xwedanên hin dersên zêde jî.

Pêkhînerê we yê xizmetan dê arîkariyê bide we kursekê hilbijêrin ku li gor pêdiviyên we be ku encama herî baş bo we misoger bike. Li demên cuda da kursên temam-dem û niv-dem li cihên cuda hene lewma hûn dikarin li her der û dema guncaw be fêr bibin.

Pêvajoyên hînbûnê

Bo ku pêdiviyên we baş pêk werin, pêkhînerê we yê xizmetên AMEP`ê dê arîkariyê bide hûn ji her du pêvajoyên fêrbûnê hilbijêrin:

- Pêvajoya inglîsiya beriya karkirinê – bo mişteriyên ku hez dikin inglîsiya karî fêr bibin ku li cihê kar beşdar bibin, yan perwerdeya zêdetir ku dikare bibe encama karê mayînde.
- Pêvajoya inglîsiya civakî – bo mişteriyên ku dixwazin şiyana xwe di axaftina inglîsî da xurt bikin ku arîkariyê bide wan bi awayê civakî beşdar bin û xwebaweriyê bi dest bînin ku li civaka xwecih da bi awayê serbixwe bijîn.

Hûn renga bikaribin 510 saetên xwe yê terxanbûyî li yek ji pêvajoyan yan li her duyan derbas bikin.

Miştiriyên ku diravê piştevaniya derhatê bi erkdariya duyalî werdigirin nikarin bibin xwedanên mercêb pêvajoya inglîsiya Civakî.

Eger nikaribim biçim kursê, dê çi bibe?

Eger hûn nikaribin biçim kursê, bi berpîrsê xwe yê xizmetên AMEP`ê ra biaxivin. Berpîrsê xizmetê renga bikaribe arîkariyê bide hûn bi mamosteyê li malê yan bi awayê Internetî digel rêya perwerdeya ji rêya dûr bi arîkariya AMEP`ê fêr bibin.

Herwiha, hûn dikarin bixwe û bi rêya rêbazên perwerdeya elektronîkî ya AMEP`ê li navnîşana www.amepdl.net.au hîn bibin. Ev dersên belaş ji bo her kesî ne (ne tenê miştiriyên AMEP`yê) ku arîkar bin gel inglîsî fêr bibin.

Bernameyên AMEP`yê yê kêlekê

Eger pêdiviyên we yê taybet hebin, renga hûn perwerdeya zêdetir bibînin.

Bernameya Amedabûnê ya Taybet (Special Preparatory Program)

Special Preparatory Program (SPP) saet û piştevaniya zêdetir ên fêrbûnê bo kesên xwedan mercên koçberiya mirovdostane raber dike ku tecrubeya wan a beriya koçberiyê dijwar bûye û kêmxwendî ne.

Rêyên Zimanê Cîwarbûnê bo Kar û Hînkariyê (Settlement Language Pathways to Employment and Training)

Settlement Language Pathways to Employment and Training (SLPET) ji xwendekarên xwedan merc ra dersên bo armanca karkirinê pêşkêş dike ku arîkariyê bide wan inglîsiya taybet bo kar fêr bibin hevdem jî bi kiryar û çanda cihê kar li Avûstraliyayê ra nasyar dibin.

SLPET heya 200 saet dersên zêde yê perwerdeya inglîsiya taybet bo kar herwiha heya 80 saetî cîwarkirina tecrubeya kar li pêşekariyên cûr bi cûr pêşkêş dike.

Dirêjkirina AMEP`ê (AMEP Extend)

Bernameya AMEP Extend`ê heya 490 saet perwerdeya zêde bo xwendekarên xwedan merc pêşkêş dike ku bêyî gihîştina armancên xwe yê kêrhatîbûna inglîsiya xwe 510 saetên xwe yê pêwîst derbas kiribin.

Muqatebûna ji zarokan a AMEP`ê (AMEP child care)

Berpîrsê we yê xizmeta AMEP`ê dikare bo dema hûn li kursê ne imkana belaş a muqatebûna ji zarokan amade bike. Muqatebûna belaş a zarokan tenê bo zarokên jêr temenê dibistanê ye.

Rênîşana rêya AMEP`ê (AMEP pathway guidance)

Berpîrsê xizmetê yê AMEP`ê rênîşana rêyê bo arîkariya we pêşkêş dike ku hûn bigihîjin armanca xwe, bijareyên xwe têbigihîjin û li bara perwerdeya xwe, hînbûna zêde û derfetên kar zêdetir biryarê bidin.

Bo agahiyên zêdetir

AMEP	Hûrgiliyên pêwendiyê
Telefon	13 38 73
Malpera AMEP`ê	www.education.gov.au/amep
E-name	skilling@education.gov.au
Agahiyên bi zimanên bilî inglîsî	www.education.gov.au/amep-information-other-languages
Li ku dikarin inglîsî fêr bibim? Pêkhînerên AMEP`ê û navendên hînbûnê	www.education.gov.au/adult-migrant-english-program-service-providers
AMEP online	www.amepdl.net.au